


Yelda û Rasan

»»»» R:2



Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (316) 21-12-2017 Buha (1000) Tûmen



Rostem Cehangîrî endamê Deftera Siyasî ya PDKÎ

Peyama Komîsyona Siyasî-Nizamî a PDKÎ bi boneya roja "Pêşmergê Kurdistanê"

»»»» R:4

Pêşmerge hilgirê felsefeya jiyaneke azad û wekhev e







Roja "Pêşmergê Kurdistanê" hem di binkeyên PDKÎ, û hem jî li derveyî welat, û li navxwe a Rojhilata Kurdistanê de, bi awayê belavkirina trakt û pûsterên taybet bi vê rojê, û bi her awayekî ku ji destê endam û alîgirên PDKÎ hat, ew roj pîroz kirin.

-Bi boneya 26`ê Sermawezê, roja "Pêşmergê Kurdistanê", di binkeya Deftera Siyasî a PDKÎ de, rêûresmeke taybet bi vê rojê hate lidarxsitin.

Roja Yekşemî 25`ê Sermawêza 1396`an, roja "Pêşmergê Kurdistanê", bi beşdariya "Mistefa Hicrî" sekreterê gîştî yê PDKÎ, Endamên rêberî, Kardr, Pêşmerge, Endam û malbatên pêşmergeyên PDKÎ, di binkeya Deftera siyasî a PDKÎ de hate lidarxisitin.

Rêûresm bi xwendina sirûda neteweyî a" Ey Reqîb" û ragirtina deqeyekê bêdengî ji bo rêzgiritin ji canê paqij yê şehîdên riya azadî û serbestiya Kurdistanê, bi taybet şehîdên "Rasan"ê dest pê kir.

Piştre peyama Komîsyona Siyasî-Nizamî a PDKÎ, ji aliyê "Rostem Cihangîrî" endamê Deftera Siyasî a PDKÎ, taybet bi roja "Pêşmergê Kurdistanê" pêşkêşî beşdarên vê rêûresmê kir.

Cihangîrî di axavtina xwe de, derheqê vê yekê de got ku: "Îro 26`ê Sermawezê di dîroka xebata azadîxawzî a neteweyî a Kurd de, rojeke girîng û destpêka guherînkariyeke dîrokê ye. 72 salan berî niha di rojeke wiha de, wate di 26`ê Sermaweza 1324`an (1945`an) de, xelkê serhildêr yê Mehabadê, ji bo paqijkirina demûdezgehên serkutker yên desthilatdar êrîş birin ser binkeya dawiyê a zilmê wate şarevaniyê, û şûnvarên zilmê, di vê devera Kurdistan de ji nav birin, û alaya Kurdistanê bilind kirin".


-Herwisa rêûresma roja "Pêşmergê Kurdistanê" ji aliyê Hêza Taybet a PDKÎ ve jî li ser çiyayên Kurdistana Rojhilat bi rê ve çû.
Di vê merasimê de Rehîm Mengorî fermandê Hêza Taybet a PDKÎ di çiyayên Kurdistana Rojhilat de, tevî bixêrhatinkirina mêhvanan, roja "Pêşmergê Kurdistanê" li hemû beşdaran pîroz kir.
Navbirî di beşeke axavtina xwe de got: "Neteweyek ku hêza xwe hebe, tu carî naşkê, û ew hêza ku gel pêre be, di dawiyê de ser dikeve, û piştevanê herduyan jî ev çiyane ne".
Piştre Teymûr Mistefayî endamê Deftera Siyasî ya PDKÎ bi boneya roja "Pêşmergê Kurdistanê" çend gotinek pêşkêş kirin.
Mistefayî ragehand: "Em li vir kom bûne, da ku di vê roja dîrokî de, rêz ji pêşmergeyên xebatkar ên riya azadiyê, xortên cangorî û berevankarê gel û xaka nîştiman bigrin. Hekî bi sedema cangorîtî û bergiriya hêza pêşmerge di nîştimana me de nebûya, niha em bi tewahî hatibûn asîmîlekirin, û nîştimana me jî bo hertim dikete jêr çekmeyên reş ên dagîrkeran, û tu hêviyek ji bo rizgariyê tê de xûya nedikir".
Navbirî di beşeke din ya axavtina xwe de bas ji vê kir: "Rejîma kevneperest û dagîrker bona bêhêvîkirina xelkê Kurdistanê, oportonîstane wisa nîşan daye ku hizbên Rojhilat nemane, mixabin dostên me jî, ku ew pêngava berpirsane ya hizba me, zêdetir bona liberçavgirtina rewşa wan berçav hatiye girtin, hizbên Rojhilat û tevger û hêza pêşmergeya vê beşê lawaz hesibandine. Ji aliyekî din ve hebûne, û hene, kesên wisa ku

»»»» R:3

www.arsivakurd.org

Sergotar

Yelda û Rasan



N: Kerîm Perwîzî

Ustûreya Yelda û hizra Rasanê gellek rengê hevdu didin, û renge şoreş û serhildana di nav bîr û baweriyên neteweya Kurd de, ji van çavkaniyan ve têrav bibin,ku di çarçoveya lênihêrîna dîrokî-kulturî, derheq cîhanê tê pênasekirin.

Şeva Yelda ku di nava Kurdan de wekî şeva çileyê tê nasîn, ger em ji pênaseya wê ya xwezayî bigerin ku guherîn e di xwezayê de, û kurtî û dirêjiya şev û rojan guhertin bi ser de tê, di kultura xelkê navçeya Rojhilata Navîn de, bi şevekî girîng tê nasîn ku ji baweriyên herî kevn ên xelkê resen ê mezopotamiya û zagrosnişînan ve çavkanî digre.

Di bîrkirina zagrosnişînan de ku Kurd xwediyê rastîn ê heman mîrata kulturî û dîrokî û regezî ne, di şeva herî dirêj ya salê de, şerekî giran û rikeberiyeke tund di navbera tarîtî û ronahiyê de rû dide, û piştî vê şevê, di nava şikeftekê de Mîtrayek ji dayîk dibe, û serê xwe ji şikeftê derdixe, û avedanî û jiyanê bo cîhanê tîne.

Eva çira û xetîra palder û hêvîbexş a xelkê wê herêmê, û bitaybetî Kurd bûye, ku piştî her bêdengiyeke dirêjheyam, û her tarîtiyekê, û piştî her tengaviyeke dêrokî, sirûda serkevtin, ronahî, û azadî û hêviyê ji dayîk dibe.

Şeva Yelda ku li usture û bîrdanka dîroka neteweyekê de, bûye tûrikê watebexşîn û watazayiyê di pêvajoya dîrokê de, digel bûyerên din jî têkel bûye, û hemû demekê watayên wê pirrbuhagiran û girantir bûne.

Felsefeta “Heq” û “yekparçeyiya Herêmî” (Beşa 2)



Kerîm Perwîzî

Têgeha çewt ya Yekparçeyiya Îranê

Hekî mirov di nava hemû belge û peymannameyên navneteweyî ên taybet bi mafê mirovan û mafê girûp û neteweyan de bigere, tiştekî bi navê parastina yekparçeyiya welat yan xakê nabîne.

Carrnameya cîhanî ya mafê mirovan ku serî heta binî bas ji mafê mirovan dike, û di hemberî destdirêjiyên dewletan de berevaniyê ji mirovan û civakan dike, ne tenê bas ji yekparçeyiya herêmî û van têgehên şovînîstî nake, belkû bi zelalî bas ji mafê mirovan bo hilbijartina cihê jiyanê, û heya di xala 28 a carrnameya cîhanî ya mafê mirovan de jî, bas ji serûberî û yasayeke navneteweyeî û civakî dike, ku dibe bo parastina mafê mirovan pêk bê, û mafê mirovan li pêş serweriya dewletan de dadinê, û ya serwetir mirov e, ne îradeya dewletan.
Peymannameya mafên medenî û siyasî û herwisa peymannameya mafên aborî û ferhengî û pirotokolên hevpêç her hemû jî bas ji mafê mirovan û girûpan û gelan dike.

Di rastî de eva ku di felsefeya vê peyman û carrnameyê de tê dîtin, pêk tê ji girîngîdana bi mirov, ne girîngîdana bi îradeya dewlet û herêma jêr deshilata wê de. Hekî ew deshilata jî li dijî demokrasiyê û dijîmirovî be, êdî eva rê dide nezma navneteweyî ku zextê jê re bîne, da ku mafê tak û girûpên jêr destê xwe de cîbicî bike.

Tenê cihek ku di belgeyên cîhanî de, bas ji dewlet û yekparçeyiya herêmî dike, belavoka NY ye.

Di xala duyem ya vê belavokê de ku pêkhateya NY bas dike, û welatên endamê vê rêkxirawê qebûl kirine, hatiye:

All members Shall refrain in their international relations from the threat or use of force against the territorial integrity or political independence of any state, or in any other manner inconsistent with the Purposes of the United Nations.

Ew xal dibêje:

“Hemû endam di pêwendiyên navnetewyeî de xwe dûr digrin, ji bikaranîna gefan yan bikaranîna zorê li dijî yekparçeyiya herêmî yan serbixweyiya siyasî ya her dewletekê, yan bikaranîna her riyekê ku digel binemayên NY dijberî hebe”.
Ew xal sê stûnên wê ên serekî hene ku berçav û zelal in:

Yekem bas ji dewletên endam dike.
Duyem bas ji pêwendiyên navneteweyî dike.
Sêyem çemk û têgeha yekparçeyiya herêmî di biyavê pêwendiyên di navbera dewletan de hatiye pênasekirin. Da ku bi vî rengî sînorê deshilata her dewletekê pê pênase bike.

Ya ku di Îranê û di bîrkirina şovenîstî de cih girtiye û dixwazin ku bikin hejmoniya siyasî û hizrî di nava hemû Îranê de, ew e ku bi mifahwergirtina bêcî ji destewajeyekê ku ji bo diyarîkirina sînorê di navbera du yan çend dewletan di pêkhateya NY de îşare pê hatiye kirin, bîrokeyeke çewt ava dikin ku pîroziyê bibexşe sînorê Îranê, û destewajeya “Parastina yekparçeyiya xaka Îranê” jê derxistine, û bi kar tînin, da ku hemû girûp û neteweyên Îranê stûxwarê deshilata navendî bikin.

Di rastî de bi vê destewajeya çewt hemû xal û bendên carrname û peymannameyên cîhanî pûç dikin, û dibêjne te, ku tu dibe sond bixoy ku dev ji mafê zelal û eşkere û bê xîçûxwar ê xwe berdî, ku di peymannameyên mafên medenî û siyasî de hatiye, û sondê bo deshilata navendî bixoyî, ku stûxwarê îradeya neteweya hakim dibî, û dev ji îradeya xwe berdidî.
Ecêbtir ji hemiyê, eva ku hemû girûpên Fars jî îdiaya demokrtaîkbûn û pêbendiya bi carrnameyên cîhanî dikin, ew jî her bas ji destewajeyên şovenîstî ên wekî parastina yekparçeyiya herêmî di nava neteweyan û civaka Îranê de dikin, û bi navê demokrasî û pêbendbûna bi mafê mirovan ve jî, vê yekê difiroşin te, û wisa kirine ku her hizb û girûpeke neteweyên stemlêkirî ku sonda wê destewajeyê bo wan nexwe, bi çavê cudahîxwaz û emrazê destê bîhaniyan didin nasîn.

Li ber vê yekê destewajeya “Parastina yekparçeyiya xaka Îranê” wekî destewajeyeke şovenîstî em nas dikin, jiber ku ji destewajeyeke rêkxirawa navneteweyî di pêwendiyên navdewletan de, mifaha bêcî werdigre, da ku neteweyên stemlêkirî di nava civakê de stûxwarê îradeyeke stemkarane bikin.

Ya ku ji vê dîtingehê ve cihê girîngîpêdanê ye, deshilata dewletê

Di qonaxeke hestiyar ya dîroka Kurd de, sala 1309 (1930)`an di havînê de şoreşa Kurd têk diçe, û rêberê şoreşê ku rêberê tevgereke neteweyî bûye, bi tîra îxanet û derevan tê şehîdkirin. Piştî şehîdbûna Simkoyê Şikak Kurdistan dikeve nava mij û dûmana xem û kovanan de, û bargiraniya îxanetê û bêdengiyeke cergbir û birîndarker per û baskên xwe bi ser Kurd de dikêşe.

Di demeke weha de ye, ku mîtrayeke din ji dayîk dibe, û rast di şeva Yelda de, ciwamêrê Kurdan, kesek ji regeza Mîtra û rojê, wate Qasimloyê rêberê şoreş û şoreşgeriyê, û watabexş bi jiyan û xebatê ji dayîk dibe.

Di serdemekê de, ku tevgera Kurd û Kurdistanê, ji şîpelan dikeve, û siwarçakê qada xebat û tekoşînê, li ber wan sedemên ku gellek caran me bas lê kiriye, çeperê ji germûgurriyê dixe, bo heyama 20 salan jî xebat sirr û sar dibe, lê ji nişkêva hêvî per û basakên xwe bi ser asoya xebat û tekoşînê di Rojhilata Kurdistanê de dikêşe, lê Rasan li ser heman hizr û felsefeya Yeldayê, di rastî de hêzdana bi xebat û kûreya jiyanê, sirûdeke nû di guhê civakê de dixwîne.

Sirûda nû ya Rasanê, reh û rîşe di kultur û lênihêrîna Kurd, û ji watabexşînên rêberê şoreşê Qasimloyê rêber û nemir wergirtiye, û demarên efsaneyên civakê dilivlivîne, lewra dilê xelkê digel dilê Rasanê lê dide.
Yelda û jidayîkbûna hêviyê û salvegera hatina bo nava jiyanê ya rêberê nemir, Dr. Qasimlo li Kurdistan û li “Rasan”iyan pîroz be.

www.agirî.org

»»»» **Doma Manşêtê**

xebata pêşmerge wekî hêcet ji bo serkutkariyên rejîmê anîne, û wisa piropagende kirine ku hekî xebata hêza pêşmerge nebûya, rejîma dijîgelî ya Komara Îslamî wê awrî daba Kurdistanê, û wê Kurdistan vegeşandiba, û bêkarî wê bihatiba çareserkirin, û Kurdistan jî wê avedan bibûya".
Mistefayî herwisa bas ji vê kir ku: "Ragirtina xebata çekdarî di vê heyama dirêj de, bes bû bo vê ku ew taqm tê bigihîjin ku rejîm ne tenê Kurdistan avedan nekiriye, belkû bi pîlanên hûr û pirrxerc û berfireh dest daye helandina nasnameya neteweyî û çandî ya Kurd, û bedela avedanî û pêkanîna derfeta kar, zêdetir ji berê Kurdistan kiriye armanc, û xelk ber bi hejariya zêdetir ve biriye".

-Rêûresma 26`ê Sermawezê di navenda 3 ya Kurdistanê de jî hate lidarxistin

Di vê merasimê de "Îdrîs Hormozî" endamê rêveberiya Navenda 3 peyama taybet a Navenda 3 pêşkêşî beşdarên vê rêûresmê kir.



Piştre sirûda "Pêşmerge tu sengerî" ji aliyê koma muzîkê ya Navenda 3 a Kurdistanê (Cejinekan) ve hate pêşkêşkirin.

Naveroka hemû wan merasiman pêk hatibû ji helbest û stran û sirûdên taybet bi vê roja pîroz, û herwisa govend û dîlana Kurdî.

-Ji aliyekî din ve, endam û alîgirên PDKÎ serbarê rewşa tund ya ewlehiyê, bi teqekirin, belavkirina tirakt û pûsterên taybet bi vê rojê û belavkirina şîrîniyan rêz ji vê roja pîroz girtin û digel hemû şehîdên riya azadiya Kurd û Kurdistanê peymana emegdariyê nû kirin.
-Li derveyî welat jî bi heman şêweyî, di gellek welatan de endam û alîgirên PDKÎ bi pêkanîna semînaran û merasiman ew roja dîrokî bi bîr anîn, û rêz ji roja Pêşmergê Kurdistanê girtin.

bi ser herêma jêr deshilata wê de ye, ku dibêje dibe ew herêm parastî be, û dewlet bi hemû şêweyekê deshilatê bi ser wê herêmê de bisepîne. Dîtingeheke wisa ye ku rewayiyê dide deshilata Bexdayê jî, da ku bi hevkariya Spaha Pasdaran û bi êrîşa Heşda Şe`ibî û afirandina bi sedan tawanî, û Kerkûkê dagîr bike, ji vê dîtingeha şovenîstî ve mirov û girûpên nava civakê şert û bingeh nînin, belkû ya hewce deshilata dewletê ye, û hekî hewce be, dikare hêzê bi kar bîne, da ku girûpan stûxwarê îradeya navendê bike, di demekê de ku felsefeya mafê mirovan û gelan berevajiyê vê ye.

Bona zêdetir selimandina basan em dikarin îşarê bi helwesta welatên wekî Brîtanya û Kanadayê bikin, û mînakên din jî zaf in, lê tenê ew du mînak bes in, bona vê ku em bizanin ku ew destewajeya tenê bo pêwendiya di navbera dewletan e, ne neteweyên nava welatekî de.

Hem li Birîtanyayê, piştî hatina berbas ya destewajeya diyarîkirina çarenûsê rê bi Skotlendayê hatiye dan ku gişpirsiyê bo çarenûsa xwe bike, hem jî di Kanadayê de, rê bi xelkê Kêbikê hatiye dan, ku her demekê xwastin referandomê bikin, û hekî hez kirin jî, dikarin welatê xwe ava bikin.

Di çi baseke siyasî ya di navbera wan du welatan de jî negotine ku referandom li Sikotlend yan Kêbikê li dijî destewajeya "Parastina yekparçeyiya herêmî" ye!. Gelo Birîtanî û Kanadayî bi qasî Farsên Îranê ji mafê mirovan û mafê gelan tê negihîştine?

Yan dema ku Kurdistana Îraqê xwast ku giştpirsiyê bo diyarîkirina çarenûsê bike, eva tenê hikûmeta Tirkiyê û rejîma Îranê û hêzên Fars bûn ku bas ji destewajeya parastina yekparçeyiya Îraqê dikirin, û hemû hêzên cîhanê nakokî û qise li ser dema encamdana wê hebûn, ku digotin şerê li dijî DAÎŞ`ê lawaz dike, yan digotin digel Bexdayê li hev bikin, da ku alozî pêk nehê.
Qet nedigotin ku eva li dijî yekparçeyiya herêma Îraqê ye û mafê Kurd nine!.

Hekî parastina yekparçeyiya herêmî bibe bingeha bîrkirina me, di Îrana bê de jî, ku Komara Îslamî nemabe, û demokratîk jî be, wê demê hekî neteweyekî xeyrî Fars û xeyrî Kurd xwast ku dewleta xwe ava bike, ew li dijî yekparçeyiya herêma Îranê dibe, û wê demê Kurd dibe alîkar be da ku deshilata navendî bi ser wî gelî de bisepe.!

Yan ger di nava Kurd de hêz û aliyê wisa peyda bû, ku daxwaza avakirina dewleta Kurdistanê kir, wê demê dibe ku li dijî wê bisekinin, jiber ku bingeha bîrkirina me birine jêr pirsyarê û li dijî wê kar dike!

Eva ku bîrkirina şovenîstî dike, şiroveya dilxwaz a wê ye ji belge û peyman û deskevtên cîhanî, ku rast berevajiyê şovenîzmê bo parastina mafê mirovan û gelan ji destê destdirêjiyên dewletê hatine holê.

"Parastina yekparçeyiya xaka welat" tenê tê kirin ku li hember dewletên din de, bê pênasekirin. Wekî wê demê ku PDKÎ ragehand ku li hemberî êrîşa rejîma Îraqê de amade ye ku bergiriyê ji Îranekê bike ku mafê Kurd tê de parastî be.

Taktîkek ku serê stratejî û armancanê dixwe

Derheq bi hatina berbas ya destewajeya "Parastina yekparçeyiya xaka Îranê", û qebûlkirina wê ji aliyê hinek kesan ve di nava Kurd de, zêdetir hawara xwe dibin ber vê hêcetê, ku ew xal wekî taktîkekê ye, da ku dilê hinek ji girûpên sertaserî pê razî bike, û ew xal bi awayekî îşar pê hatiye kirin, yan tê kirin, ku bi tewahî ew şêwe lênihêrîna girûpên Fars tê de nehatiye. Di pêxema qebûlkirina mafê neteweyan, ji aliyê van girûpan ve, ew îmtiyaz û poan, bi wan tê dayîn, da ku bikarin hêz û girûpên din ên Fars jî bo aliyê xwe rakêşin.

Ya ku girîng e, û di pêwendiyên siyasî de berçav tê girtin, ew e ku di çarçoveya armancan de stratejî tê darêtin, û di çarçoveya stratejiya rohn de, hinek taktîkan digre pêş. Di taktîkê de, destê her hêz û aliyekî vekiriye, ku taktîkên xwe darêje, kes nikare taktîkan bo aliyê din diyarî bike. Lê ji wê jî girîngtir ew e, ku taktîk di çarçoveya straejiyê de be, ne eva ku taktîkek stratejiyê bixwe bibe jêr pirsyar, û ji vê jî xiraptir ew taktîka ye ku "armancê" lawaz dike, û serê amancê dixwe.

Di pêwendiyên siyasî û hevkariyên di navbera hêzên ser bi neteweyên stemlêkir û hêzên Fars de, diyar e ku dibe hinek taktîkan bigrî pêşiya xwe, da ku aliyê hember jî pê razî be, û renge bi dilê te nebe, ku dilê wî pê rabikêşî. Lê gelo aliyê Fars amade ye ku bi zelalî bas ji peymannameya mafên medenî û siyasî ku pêncî sal e wajo kirine bike, û bi zelalî bêje ku mafê diyarîkirina çarenûsê bo neteweyan û yek ji wan Kurd qebûl bike?

Di demekê de ku baweriya me ew bû ku Îran ji çend neteweyên cuda pêk hatiye ku tu yek ji wan sertir ji yê din nine, êdî pêkvejiyan û pêkvebûna me jî, dibe bi xwestek û hezkirina me bixwe be, û eva dewleta hevbeş e ku dibe hinde balkêşî hebe ku tu yek ji neteweyan hez ji cudabûnê nekin, ne eva ku netewe sondê bixwin, ku bi hemû şêweyekê stûxwarê Parsatina yekparçeyiya herêmî dibin.
Dema ku me destewajeyeke şovenîstî qebûl kir, ku hemû bingehên hizrî û felsefî ên wê, hebûn û mafên me dibin jêr pirsyar, êdî ewe taktîk nine, belkû devberdan e ji armanc û baweriyan jî.

Hekî baweriya me ew be, ku herwekî ku min di destpêkê de bas kir, ku pirsa neteweyî ji dîtingeha duyem ve bibînin, wate razî bin bi hebûna neteweykê bi navê Îran, û Kurd jî beşek ji vê neteweyê be, wê demê qebûlkirina destewajeyeke bi vî rengî forma taktîkê bi xwe ve bigre, lê di bîrkirineke wekî şêwe lênihêrîna yekem de, "Parastina yekparçeyiya herêmî", dûrketina ji armancê, û rûxandina stratejiyê ye.

Sazan li ser taktîk û berjewendiyên demkî tê kirin, û renge di forma lawaziya hêzê de, hindek ji maf û dawakarî bi awayê demkî bas jê nehêne kirin, lê sazan li ser bingeh û dîtingeh û armancan nahê kirin.

www.sivakurd.org

Peyama Komîsyona Siyasî-Nizamî a PDKÎ bi boneya roja “Pêşmergê Kurdistanê”

Pêşmerge hilgirê felsefeya jiyaneke azad û wekhev e



Rostem Cehangîrî endamê Deftera Siyasî ya PDKÎ

Deqa Peyamê:

Hevalên hêja!

Beşdarên birêz ên rêûresma roja “Pêşmergê Kurdistanê”!

Pêşmergeyên Cesûr ên Kurdistanê!

Îro 26`ê Sermawezê di dîroka xebata rizgarîxwazane ya Kurd de, rojeke girîng û destpêka guherînkariyeke dîrokî ye. 72 salan berî niha di rojeke weha de, wate di 26`ê Sermaweza 1324`an ya Rojî (1945`an) de bû, ku xelkê serhildêr ê Mehabadê bona ramalîna demûdezgehên serkutkar ên deshilatdar êrîş kirin ser dawî binkeya stemê, wate şarevaniya bajar, û şûnwarên stemê di vê dewera kurdistanê de tune kirin, û alaya Kurdistanê li wir hildan. Bi jinavçûna dawî binkeya deshilata paşatiyê, gelê Kurdistanê çarenivîsa xwe bi dest ve girt, û bi kiryar bû serwerê nîştimana xwe. Di wê demê de, gelê Kurd di Kurdistana Rojghilat ne hêzeke organîzekirî ya çekdarî bû, û ne jî di warê rêkxistinî de bi tewahî digel qewareya rêkxirawê nasyar bibû.

Lê bi derswergirtina ji pêşengên xebata neteweya xwe û li gora bernameya Hizba Demokrat kêm ezmûn lê bibiryar bû, û li jêr rênîşandanên Pêşewa Qazî Mihemed karî ku bilez refên xwe rêk bixe, û ber bi avakirina hêzeke neteweyî ve pêngavan bavêje.

Li gora vegêranên çavkaniyên devkî ên dîroka neteweya me di dema gotûbêja li ser navê Hêza Kurdistanê di dîwana serkomar Qazî Mihemed, basê nav û naznavên cuda dihate kirin, û di kelekela basan de, kesekî derveyî bazineya serkirdayetiya PDKÎ û birêveberiya Kurdistanê pêşniyarekê dide serkomar û hevalên wî û dibêje: “Her ji qedîm zeman ve digotne mêrxasan û kesên bicerg “Pêşmerge”. Di wê demê de hemû beşdaran gotin, eva pêşniyareke bicî ye, lewra hemû vê pêşniyarê qebûl dikin, û navê bilind ê pêşmerge bo endamên Hêza Neteweyî a Kurdistanê hilbijartin.

Bi diyarîkirina navê pêşmerge pêvajoya danîna çarçoveyeke pêşkevtî bo Hêza Kurdistanê jî dest pê kir. Di heyameke kurt de, çiqên xwe di hemû herêmên jêr deshilata birêveberiya neteweyî de belav kir, û wekî hêzeke hevçerx ya xwedîarmanc ya siyasî form girt. Birêveber û fermandeyên pêşmerge ketin jêr fermandehiya giştî de, û li gora pîvanên arteşeke serûber kar kirin, û ew pêngav bo wê serdema Kurdistanê bi bê ezmûna birêveberî û avakirina yekîneyên leşkerî ên serûber guherînkariyeke dîrokî û destpêka yasayîkirina organên deshilatê bû. Bi kiryar jî ew pêngav bû mînaka herî serkevtî ya deshilatdariyê, ku heya niha jî bi kêmî mînaka wê di navçeyên me de têne dîtin, jiber ku hêza pêşmergê Kurdistanê di hemû heyama jiyana Komara Kurdistanê de karî nezm û disiplîn û aramiya navxweyî biparêze, û rê ji alozî û bêserûberiyê bigre, û li gora biryarên serkirdayetiya siyasî ya welat tev bigere. Ji wê demê ve pêşmerge bûye parêzerê nirx û hêviyên neteweyî ên me.

PDKÎ ku şanaziya avakirina yekîneyên destpêkî ên hêza pêşmerge bi navê xwe tomar kiriye, her paş destpêkirina qonaxa nû ya xebata neteweyî li Rojhilata Kurdistanê li sala 1357`an (1979)an, ku di bernameya wê de bû rojek bo emegnasî û rêzgirtina ji nav û yad û bîra pêşmerge diyarî bike, û rewşa zehmet ya xebatê û mijûlbûna hemû rêkxirawên hizbê bi xweragiriya di hemberî rejîma dijîgelî ya Komara Îslamî de, cîbicîkirina vê birarê paş xista, heya eva ku di sala 1363`an (1984)na de, ew derfet pêk hat, û di civîna rêberiya hizbê de roja 26`ê Sermawezê bi sedema rûdana van bûyerên dîrokî ku di vê rojê de pêk hatibûn, ew roj wekî roja “Pêşmergê Kurdistanê” pêşniyar kir, û bi dengê giştî hate pejirandin, û yekem rêûresma roja “Pêşmergê Kurdistanê” di binkeya Deftera Siyasî ya PDKÎ li gundê “Gewre Dê” ya Kurdistanê di sala 1984`an de bi rê ve çû.

Ji wê demê ve hemû salekê xelkê Kurdistanê di navxwe ya welat bi belavkirina trakt û posterên taybet bi vê rojê û gellek çalakiyên din rêz ji xortên biemeg û bibawer ên xwe digrin, û di binke û biryargehên hizbê de merasimên taybet bi vê rojê bi rê ve diçin, û ew yek jî hewlek e bo rêzgirtina ji xebt û tekoşîna xortên nîştiman û palderê (handerê) nivşa nû ye bo beşdarîkirin di xebata neteweyî de. Pêngavek ku bandora wê heya heta-heta di dîroka neteweya me de wê zindî bimîne, û dibe çavkaniya hêzê bo berdewamiya xebat heya gihîştina bi hemû mafên neteweyî ên gelê Kurd.

Tevlîbûna deste-deste xortên emegdar ên Kurdistanê digel pêşmergeyên hizbê û hêzên din ên xebatkar ên Kurdistanê, mînaka herî berçav ya bandorên vê pêngava dîrokî ne.

Hevalên Pêşmerge!

Hekî destewajeya “Pêşmerge” her tenê navek, çekek, cilûbergeke leşkerî û zincîreyeke fîşekan bûya, bêguman niha refên pêşmergeew qas zêde bûn ku nedihatin hejmartin. Lê pêşmerge tenê çekhilgirekî birêveberê her fermanekê nine, pêşmerge pêşengê xebat bo jiyaneke baştir bo neteweya xwe ye, wate hevdem digel hilgirtina çekê, hilgirê baweriyeke mirovdostane ya siyasî ye, ku bo nirxên bilind ên wekî wekhevî, mafê takekes û giştî jiyaneke hejî, û dûr ji çewsandin û dûr ji ferq û cudahîdanînê tekoşînê dikin, û her yek ji wan nirxan pêkhînerê qewareyeke siyasî û hizrî ne, ku felsefeya hebûn û jiyana pêşmerge ji jiyana hêzên din ên çekdar ên birêveberê her fermanekê cuda dike.

Pêşmerge hilgirê felsefeya jiyaneke azad û wekhev e, û dîtingeha pêşmerge bo mirovayetî, maf û jiyan û azadî bi tewahî ji dîtingeha hilgirên felsefeya berjewendîxwaz û daxistî, û dugm û kevenparêz cuda ye. Jib o pêşmerge her mirovek xwediyê her reng, zayend, ol, kultur, ziman, yan hilgirê her bîrûbaweriyeke siyasî, fikrî, yan ayînî be, tu cudahiyek di navbera wan de nîne. Ol û ayîn pêwendiya wê bi boçûna takekes ve heye, û di felsefeya pêşmerge de nabe emrazê cudahîdanînê, dana poanan, yan jî zewtkirina maf û poanan ji kes yan pêkhateyekê.

Her bi vê pêkê jî, ziman, kultur, yan cudahiyên din ên berçav û zêhnî, nabin sedema danîna cudahiyan. Vê dîtingehê hêza pêşmerge wisa perwerde kiriye, ku derî bo hemû pêkhate, takekes û girûpekê veke, ku bona rizgarbûna ji dugmbûn û tundrewiyê tekoşînê dimeşînin.

Mînaka pêbendbûna pêşmerge bi nirxên bilind ên mirovahiyê ew qas zaf in, ku rîzkirina tenê beşek ji wan di vir de zehmet e, lê ne tenê gelê Kurd belkû hemû mirovahî îrorojê şahidiyê bo vê dide, ku eva pêşmergê Kurdistanê bû ku di hemberî îde-

www.siyakurd.org





Pêşmerge bû sembola azadî, û pêşengê jiyaneke cudatir ji jiyana bindestiyê, û bû mînaka xweragiriyê di hemberî bêdadiyê de.

olojiya bêhngenî ya pirr metirsî bo mirovahiyê, wate dîtingehên Wilayeta Feqîh û xilafeta dînî di forma Komara Îslamî ya Îranê de, û dewleta Îslamî ya naskirî bi DAÎŞ û bîra şovenîstî ya layîk sekinî ye. Ew helwesta gelê Kurd bo hêza pêşmerge bû ku navê bilind ê pêşmerge ji çiyayên serkêş ên Kurdistanê ve bo ser lûtkeya biryardanê di siyaseta navneteweyî de wekî koşka Spî, koşka Elîze, Kirêmlîn, û baregeha NY biriye, û kiriye navûdengeke bilind ya navneteweyî.

Her ji vê dîtingehê ve ye jî, ku em dibînin jidayîkbûna destewajeya pêşmerge di rastî de jidayîkbûna hêviyekê bû, hêvî bi pêşerojê, hêvî bi azadî, hêvî bi wekhevî û hêvî bi jiyaneke dûr ji bêdadiyê.

Pêşmerge bû sembola azadî, pêşengê jiyaneke cudatir ji jiyana bindestî û mînaka xweragiriyê di hemberî bêdadiyê de.

Pêşmerge bû reng û dîmenek nû bo çiyayên serkêş ên welat, û bejna her çiyayekî bilindtir, reh û rîşe kûrtir, hêza xweragiriyê zêdetir û ciwaniyên wê dilrevîntir kir. Ji vê rojê ve ku navê pêşmerge navdar bû, neteweya Kurd jî xatircemiyeke zêdetir peyda kir ku êdî bê kes û bê pişt nine, û her dememkê bixwaze, diakre pêgeha deshilatdaran û zordaran bilerizîne.

Bilindahiya nav û pêgeha pêşmerge, bihêzbûna hêviyên gelê kurd û mirovahiyê û ew erk û wezîfeya giran lê pirr ji şanazî ku hêza pêşmerge û bitaybetî di vê qonaxa hestiyar ya xebata çiya û bajar de, wate "Rasan" a Kurdistana Rojhilat girtiye stûyê xwe, hukm dike ku hêza pêşmerge û her takeke hilgirê navê pêşmerge berî destbirina bo çeka xwe, bîr ji berpirsayetî û pêgeha pêşmerge bike. Dibe hemû ew nirxên ku parastina wan di Rojhilata Navîn de bi navê bilind ê pêşmerge ve hatiye tomarkirin, û bi vî navî ve tê nasîn, di reftar û îradeya hemû pêşmergeyên me de xwe nîşan bide. Jiber ku pêşmergê Kurdistanê tevî hilgirtina çeka parêzgarî ji nirxên me, pêşerngeke siyasî ye, ku digel vê ku destûr û biryarên sertir ên xwe bi rê ve dibe, di heman demê de, ew takek e ku şiyana hilbijartinê heye, biryarê dide, pak û napak li gora van nirxên ku pê pêbend e, ji hev cuda dike, û di hemberî nedirustiyê de, di her rewşekê de, û li her cihekî be, helwestê digre, û tekoşînê dike.

Îrorojê hevdem digel gelê Kurd, hemû gelên hişyar û serwext ên cîhanê bi hurmet ve, li pêşmerge û wan nirxan dinihêrin ku pêşmerge wan diparêze. Herçend berjewendiyên teng ên deshilatdaran îzin nadin ku neteweya Kurd bi hezkirina xwe, qedera xwe diyarî bike, lê guman di vê de nine ku rasan û xweragiriya hêza pêşmerge, pêşerojeke geş bo neteweya me misoger kiriye, ku dereng yan zû, deriyê azadiyê bo me vedike, lewra dibe ku îrorojê bi xatircemiyeke zêdetir û bi vîneke qahîmtir û bi baweriyeke hesinîn ve pêngavên xwe bo yekxistina şiyanan, û refa nava tevgera civaka Kurd di Kurdistana Rojhilat bileztir bikin, jiber ku neteweya me hêjayî pêşerojeke baştir e, û çavnihêriya vîna hêza pêşmerge bo bidestxistina vê pêşerojê ye.

Rêzdarno!

Herwekî hûn dibînin cewhera "jiyana ebedî" bi giştî xewna hertimî ya mirov bûye. Mirov û bi giştî tu jîndarekê heya niha jî nekariye ku xwe ji bazuneya mirinê rizgar bike, herwekî ku çawa jidayîkbûn dikeve nav xaneya "cebr" de, mirin jî di vê bazineyê de dernakeve, û jiyana heta-hetayî jî xewneke hertimî ye, ku ser nagre.

Lê karvedana mirinê di wateyên jiyanê de dibe hander û sebebkarê vekirîbûna destê mirov bo dariştina pîlanan û terhên domdirêj di jiyana xwe de, bona vê ku cudahiyekê di biyavê wate û naverokê de di navbera (jiyan û mirin) û man û nemanê de bibîne, û ji vê dîtingehê ve, wekî mirovekî derbazbûyî ji bêhêvîtiya bazineya cebra dasepayî, serederiyê digel jiyan û qedera xwe de bike. Zor û cebrê bixe qedeman, û li mirinê bikene, û bêje ku li gora cebra xwezayê ez ji dayîk bûme, û li gora vê cebrê jî ez dimirim, lê eva ez bixwe me ku biryarder im li ser çawaniya mana xwe, û hekî biryar jî be ku cebra nemanê qebûl bikim, eva ezê mirinekê qebûl bikim ku bi qasî cewherê jiyanê be. Eva ez im ku min sînorê tirs û nemanê derbaz kiriye. Eva ez im ku li ew qasê hezkirina li jiyanê, bo asûdeyiya jiyana xwe û neteweya xwe, û bi giştî rehetiya mirov tekoşînê dikim, û hekî di vê rêbazê de canê xwe jî gorî bikin, min tirs nine, û eva ez im ku pêş merg û mirinê dikevim û bi mirinê dikenim, û dibêjim ku ez naznavê pêşmerge xwe re hildibjêrim, û cebra mirinê bi îradeya xwe diyarî dikim, wateyê dibexşim bi mana xwe, û dibêjim ku heta ez heme mirin nine, û hekî ez mirim eva ez wateyê dibexşim nemana xwe, û digihîjim qonaxa hermanê, lê hermanek di naxê vijdana mirovahiya gelê xwe û di naveroka dîrokeke biçirûsk de. Jiyan û mirin, man û neman wateya xwezayî ya xwe ji dest didin, û wekî man û çawa jiyankirinê dibin wateya serekî ya jiyanê. Ew yek jî felsefeya mana nav û pêgeh û hezkirina pêşmerge ye.

Hevalên pêşmerge
Roja we pîroz, Dema we baş, û jiyana we pirr ji şanazî
Yad û rêbaza şehîdên gel û nîştiman, bi taybetî şehîdên Rasanê bilind û bilindtir be

Serkeve xebata rizgarîxwazane û neteweyî ya Kurd
Mirin û neman bo dijminên gelê Kurd, bitaybetî Komara Îslamî
Komîsyona Siyasî-Nizamî ya PDKÎ

26.09.1396
17.12.2017

www.rasiyakurd.org

26`ê Sermawezê dîroka hêzekê, ku bûye rûmeta neteweyekê





N: Îbrahîm Qasimîzad

Di sala 1984`an de, PDKÎ roja 26`ê Sermawezê wekî roja rêzgirtin ji ked û berxwedana Pêşmergeyên Kurdistanê destnîşan kiriye. Lewra ew roj ahte diyarîkirin jiber ku di vê rojê de, xebatkarên Kurd li bajarê Mehabadê êrîşî ser avahiyên rêjîma paşatiya Îranê kirin û di nav de Şarevanî û hemû saziyên dewletê xistin bin destê xwe de.

Bi vî rengî di wê rojê de, ango 26`ê Sermawezê, ne tenê dîrokek nû hate avakirin, belku tovê şoreşgeriyê li ser esasê xwedîderketin ji nirxên neteweyî û rûmeta gelê Kurd di Rojhilata Kurdistanê de hat çandin.

Di gel guhertinên ku li Rojhilata Navîn de çê dibin, gelê Kurd zêdetir ji caran pêwîstî bi rêkxistin û yekîtiya nav mala xwe hene, lewma Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê di qonaxa nû ya xebatê û stratijiya xwe de pêngava ”Rasan” daye destpêkirin, û dubare hêza pêşmerge hem li çiya û hem jî li bajaran xistiye devrê. Ciwanên Rojhilatî bi germî pêşwaziya “Rasan”ê kirin, û her roj di erkên xwe yên neteweyî de, gavên ber bi çav davêjin.

Gelê me bi rênîşandan û pêşengtiya pêşmerge ji bo bidestxistina mafên xwe û bidestvegirtina çarenivîsa xwe, mil bi milê pêşmerge şoreşek nû meşandiye. Êdî bi derketina îradeya pêşmerge guman nemaye ku ne çiyayên Kurdistanê bêxwedî ne, ne jî bajar bê stargeh in.

Niha pêşmerge bibiryar e ku tekoşîna xwe ya di hundir û derve de bi xurtî bidomîne, heta digîje azadî û bextewerîyê li ser axa xwe ya azadkirî. Gelê Kurd hertim serî li hemberî dagîrkeriyê rakiriye, û bi pêngavên berxwedan û tekoşînê re, serkevtin bi dest xistiye. Ji ber vê yekê dema ku em bizivirin ser tekoşîna gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê, em bi rengekî berbiçav dibînin ku gelê Kurd li her derî û ji bona azadî, hebûn û rûmeta xwe li ser piyan e.

Mînaka herî berçav, erdheja vê daviyê li parêzgeha Kirmaşanê bû ku nîşan da çawan gelê me di demên tengasiyê de xwedî ji hebûna xwe derdikeve. Her wusan hemû buyerên din ku di perçeyên din ên Kurdistanê de diqewimin, nîşan didin ka çawan gelê kurd, bi ciwan, zarok, jin û kalên xwe ve, ango ji heftsalî heyanî heftê salî li her derî ji bona bidestxistina mafên xwe yên jiyanê û azadiyê li ser piyan e û ji nirxên xwe yên neteweyî xwedî derdikevin.

Di hemû civakan de derketina pêşengên siyasî guhertinên mezin di nav civakê de çê kirine. Pêşengên civaka kurdî jî ji wê yêkê bêpar nînin, lê şanaziya pêşengên Kurd ew e ku rojek ji rojan di nav refên pêşmerge de li ser çiyayên Kurdistanê pêşmergayetî kirine, her wisan zêdeyî ew guhertinên ku heta roja îro di civaka kurdistanê de hatine kirin, li ser destê wan rêberên pêşmerge hatine çê kirin.

Bêguman, ev weke kevneşopiyekê ji dîrokê herikiye heya gihîştiye roja me ya îro. Komara Îslamî ya dagîrker jî vê yekê baş dizane, ji ber wê hindê bi tundî li dijî her çalakî û serketineke Kurdan li her çar parçên Kurdistanê derdikeve.

Dema ku her ciwanek Kurd, van pirsan ji xwe bike û li bersiva wan bigere, wê gavê wê tenê riya tekoşîn û berxwedanê li pêşberî xwe bibîne. Ji ber ku dujminê gelê Kurd tu rêyên jiyanê ji bona me kurdan li holê nehiştine.

Ji bo bîrnîna wê rojê û bîranîna ked, emeg, hemase û xwebexşiya pêşmerge, em bejna xwe li ber mezinahiya peşmerge ditewînin û silavan ji bo malbatên serbilind ên şehîdan dişînin.

Dayîka şehîdekî PDKÎ çû ser dilovaniya xwe



Dayîka şahîdekî PDKÎ, di bajarê Pawe de çû ser dilovaniya xwe.

Li gora nûçeya gihîştî malpera “Kurdistanmedia”yê, roja 25`ê Sermaweza 1396`an, “Fatma” dayîka şehîd “Mihemed Sarinkî” xelkê gundê “Nûryawe” a girêdayî bajarê Pawe, di temenê 85 saliyê de çû ser dilovaniya xwe.

Dayîka “Fatma” ku tenê ev kurê wê hebûye, di 20`ê Xakelêweya 1359`an de, di şerê li dijî dagîrkeriya rejîma Îslamî a Îranê de, di nav bajarê Pawe û gundê “Necar” de, ku êrîş bo ser pêşmergên hêza Şaho hatibûkirin, tevlî karvanê şehîdên PDKÎ dibe.

Şehîd “Mihemed” bi sebeba kêrhatîbûnê û şarezariyê di karûbarên hizbê de, karîbû pileyên teşkîlatî di nav hizbê de bibire, û weke kardrekî pile 4 erkên xwe yên hizbî encam bide.

Termê dayîka “Fatma” di nav girseya xelkê deverê de bi axê hate spartin. Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, sersaxiyê dibêje malbat, xizm û kesûkarên navbirî û xwe şirîkê xema wan dizane.

Diya pêşmergeyekî PDKÎ koça dawiyê kir



Diya pêşmergeyekî PDKÎ li bajarê Urmiyê koça dawiyê kir.

Li gora nûçeya ku gihîştiye malpera “Kurdistanmedia”yê, “Xemê Xanim” diya pêşmergê PDKÎ Bêhzad Simko, û hevjîna Babaxan Simko xelkê gundê Gengeçîn a Urmiyê, bi sedema nexweşiyê di temenê 82 saliyê de koça dawiyê kir.


“Xemê Xanim” jineke dilsoj û bivêr bû, navbirî yek ji endamên malbata şoreşger Simkoyê Şikak bû, ku heya dema koça dawiyê berdewam şanazî pêve dikir. Termê “Xemê Xanim” a rehmetî, di nava girseya xelkê navçê de bi axê hate spartin. PDKÎ sersaxiyê li malbat û xizm û kesûkarê navbirî dike, û xwe şirîkê xema wan dizane.

www.arsivakurd.org

Nerîna Lîderan



Osman Baydemir: “Kurdistan di nav dilê min de ye”.



Noceyfî: “Dibe Heşda Şe`ibî bi yekcarî ji piroseya siyasî bê vekişandin”.



Mêrkil: “Em piştgiriyê ji mafên destûrî ên Herêma Kurdistanê dikin”.



Macron: “Esed dijminê xelkê Sûriyê û DAÎŞ jî dijminê me ye”.

Amerîkayê li dijî rejîma Îranê biryar da



Piştî eşkerekirina stratîjiya nû a Amerîkayê, ji aliyê “Donald Trump” serkomarê Amerîkayê ve, navbirî rejîma Îranê weke gefek hesiband.

Li gora raporên belavbûyî, koşka spî derheqê stratîjiya nû a Amerîkayê ya ku derheqê rejîma Îranê belav kiriye, ragehandiye ku: **Rejîma Îranê** gef e, û dibe li hember vê rejîmê de bisekinin.

Di stratîjiya nû a Amerîkayê ya derheqê rejîma Îranê de hatiye gotin ku, cuda ji **rejîma Îranê** û girûpên terorîstî, Kureya Bakûr jî weke gef li ser Amerîkayê ye, û em dibe ku hemberî wan metirsiyane de bisekinin.

Bi awayê giştî stratîjiya nû a Amerîkayê ya derheqê **rejîma Îranê** û Kureya Bakûr de, di wan xalan de hatiye pejrandin:

-Ewê li hemberî wan metirsiyên ku hikûmeteke dîktator di Îranê de dirust kiriye, wê bisekinin.

-Dîktatoriya Kureya Bakûr û **rejîma Îslamî a Îranê**, bûye sebeba nearamiyê di deverê de.

-Kureya Bakûr û **rejîma Îslamî a Îranê** bûne gef li ser Amerîkayê û hevpemanên wê, herwiha bûne sebeba azardana xelkê wan welatan de.

- **Rejîma Îranê** piştevaniya girûpên terorîstî dike, û bi eşkere jî daxwaza jinavbirina me ji wan dike.

- Amerîka digel hevpêymanên xwe li hember girûpên terorîstî yên biyanî disekine, ku bûne gef li ser welatê Amerîkayê, ji nav wan girûpên terorîstî ku **rejîma Îranê** piştevaniyê jê dike, bo mînak girûpa terorîstî a Hizbullah a Lubnanê.

- **Rejîma Îranê** di seranserê cîhanê de, piştevaniyê ji terorê dike, û mifahê ji nearamiya welatan werdigre, ji bo berfirehkirina hejmoniya xwe ji riya girûpên terorîstî yên girêdayî bi xwe ve.

-Gefên saziyên terorîstî yên cîhanê û Îranê ev rastiya nînşan dane, ku Îsraîl sebebkarê pirsgirêkên deverê nîne.

-Digel hevpêymanên xwe kar dikin ji bo vê yekê ku rê ji **rejîma Îranê** bigirin da ku destê wê ji negihîje çeka navikî.

Di 22`ê Rezbera 1396`an de, serkomarê Amerîkayê derheq stratîjiya nû a xwe li hemberî **rejîma Îranê** de, ragehand ku du welatên Erbistana Si`ûdî û Îsraîl piştevaniya xwe ji vê helwêsta Amerîkayê ya li dijî rejîma Îranê ragehandine.

Seroka firaksiyona jinan di meclisê de: Di hinek ji navçeyên Îranê de, keç li jêr navê zewacê de têne firotin



Seroka firaksiyona jinan di meclisa Îranê de ku hevdem bi nav nûnera xelkê Tehranê ye di meclisê de, di hevdîtina bi Ayetullah Mihemed Elî Giramî ji lêvegerên Şî`e (merce`ên teqlîd) re, bas ji firotina keçên kêm temen li jêr navê zewacê de kiriye.

Perwanê Selehşûr digel rexnekirina zêdebûna zewacê di temenê zarokatiyê de got: %50 a wan zewacên ku di temeneke kêm de têne kirin, encama wê dibe ew ku, %70 ji wan tûşî nesaxiya seretanê bin.

Di sala borî de, alîkarên serkomar di biyavê karûbarê jinan de, hinek lêkolîn bona amadekirina riyên fiqhî bona dijberiya digel zewaca zûdem ya keçan dest pê kiribûn. Hevdem di firaksiyona jinan de jî hewleke wisa hebû ku temenê zewacê di yasaya medenî ya Îranê de destkarî bikin, lê wisa xûya dike ku ew hewlên wan negihîştin çi ciyekî.

Herwisa seroka firaksiyona jinan dibêje, li gora rewayiya zewaca zarokan di ehkamên şer`î de, pejirandina yasayekê li dijî van cure zewacan, di meclisê de gellekî zehmet e.

Li ser bingeha yasaya medenî ya Îranê, temenê zewacê bo keçan 13 sal û bo kuran 15 sal e. Zewaca keçên kêm temen di Îranê de berçav e. Serjimêriyên kodik (saziya sebtê ehwal) nîşan didin, ku ji sala 1383`an ve heya 1393`an nêzî 420 hezar keçên bin 15 saliyê di Îranê de zewicî ne.

www.arsivakurd.org

Pêşmerge sembola azadiyê





Dara Natiq

Di nava her netewe û civakekê de, nifşek ji civakê weke sembola azadiyê li dijî zulm û dîktatorî û çewsandinê têne rêzgirtin. Di nava neteweya Kurd de jî, pêşmerge weke sembola azadî û berxwedana li dijî dagirkarî û dîktatorî û deshilata dijîgelî, xwedî rêz û nirxek taybet e. Fîdakarî, berxwedan û destanrêsiya pêşmerge derheq parastina nasnameya neteweyî û serbestiya Kurdistanê, wate û giraniyek xasmanî daye heybet û navê pêşmerge.

Nav, armanc û peyama azadî û aştîxwaziya pêşmerge, hertim bûye sedema tirs û xofek mezin di nava dilê dagîrkerên Kurdisatê û dijminên azadî û wekhevî û mirovatiyê. Dîroka berxwedan û serboriya neteweya Kurd ew yeke daye xuyakirin ku, heya zulm û zordarî û dagîrkarî bi ser Kurdistanê de bimeşe, xebat, berxwedan û cangorîtiya pêşmerge weke sembola azadî û parastina keramet û nasnameya neteweya Kurd yê hertim berdewam be.

Şer û xebata Pêşmerge li hember dagîrkarî û terorîzm û tundajoyiya herêmî, nasname û giraniyek cîhanî daye heybet û felsefeya azadîxwaziya Pêşmerge, û di navendên xwedîbiryar ên dunyayê de, weke peyamnêr û xebatkarên aştî û azadî û wekheviyê tên binavkirin, û xelat bi wan têne bexşîn. Komara Îslamî a Îranê, yek ji dewletên dagîrker yên Kurdistanê û dijmnê azadî û mirovahiyê û sponserê sereke yê terorîzmê, bi dirêjahiya temenê deshilata xwe a dîktator, hertim di hewla jinavbirina nasnameya Kurd û tevgera azadîxwazî a Kurdistanê de bûye, û li ser pîlanên xwe yên hov û dijî mirovî li hember gelê Kurdistanê berdewam bûye. Lê serbarê vê siyaseta qirêj û dijminkarî a rejîmê, îradeya mafxwazî a neteweya me û xebata berheq a pêşmerge, weke kulek li ser dilê rayedarên Tehranê, tirs û xofek mezin xistiye nava koşka zordaran de.

Hereketa nû a pêşmerge bi navê koda “Rasan”ê di salên derbasbûyî de, serbarê piropagendeyên berdewam yên rejîmê li dijî tevgera Kurd û pêşmerge, lê cardin doza berheq a Kurd li Rojhilatê Kurdistanê, û zulm û zordarî û dagîrkariya rejîma dijîgelî a Îranê, xiste rojeva siyaseta herêmî û cîhanî, û bala tev dunyayê kişande ser pirsa Kurd. Li hemen demê de bandorek rasterast li ser liv û bizavên azadîxwazî di asta Îranê bi giştî de hebûye, û hikûmet û rewşa polîsî a Îranê xiste nav kirîzek kûrtir

Xebata pêşmerge û stratejiya hereketa “Rasan”ê, bingeha xebata neteweyî û yekrîziya nîştimanî di Rojhilata Kurdistanê de bihêztir û xurtir kiriye

de. Ji aliyekî din ve jî da xuyakirin ku heya dagirkariya Komara Îslamî û milîtarîzekirina Kurdistanê bimîne, îradeya mafxwazî a gelê Kurd û tevgera rizgarî û xebata pêşmerge weke sembola berxwedan û azadiyê, wê hertim berdewam bibe.

Tevger û peyama nû a pêşmerge bi stratejiya pêkvegirêdana xebata çiya û bajar, karî cardin tev pêkhateyên Kurdistanê bi hemî tex û qatên curbicur yên civakê bixasmanî di nava bajaran de organîze bike, û di bin navê “Pêşmergeyên Bajar”, bi seheke şoreşvanî û neteweyî, li hember doza berheq a gelê xwe xwedî derkevin, û li dijî dagîrkariya rejîma Îranê, liv û tevgera xwe xurtir û bibandortir bikin. Xebata pêşmerge di çarçoveya stratejiya bi navê “Rasan”ê, û bi rêberiya PDKÎ, hêvî û moralek mezin di nava civaka azadîxwaz a Kurdistanê de çêkir, û bandorek rasterast li ser jêhelbirina seha neteweyî û şoreşvanî a gelê Kurd û yekrêziya nîştîmanî û welatparêziyê danî. Meşa nerazîbûna xelkê Kurdistanê li hember kuştina kasibkaran, û liv û tevger, û govenda sertaserî a Kurdistana Rojhilat di newroza îsal a bi navê “Camane”, û şahiya referandoma serbixwebûna Kurdistana Başûr, serbarê rewşa emniyetî û milîtarîzekirina Kurdistanê, gewahyarê bandora hereketa pêşmerge, û asta hişyariya civaka kurdistanê baştir didin xuyakirin.

Ji hemiyan girîngtir, di dema erdheja Kirmaşanê û malwêraniya xelkê Kurd di vê deverê de, û bihawardeneçûn û piştguhxistina wî xelkî, ji aliyê rejîmê ve, xelkê Kurdistanê ji Makûyê heya Îlamê li tev gund û bajarên Kurdistanê bi komkirina harîkariyan bi hewara birayên xwe yên Kurd li Kirmaşanê de çûn, û bi yeketî û yekrîziya xwe ya nîştimanî û neteweyî, bersivek tund dane siyaseta şovenîstî û dijîmirovî a rejîma Îranê. Lewma xuya dibe ku xebata pêşmerge û stratejiya hereketa “Rasan”ê, bingeha xebata neteweyî û yekrîziya nîştimanî di Rojhilata Kurdistanê de bihêztir û xurtir kirye, û kariye tevgera Kurd bi giştî li hemberî dagîrkariya rejîma Îranê, de organîzetir bike.

www.arsivakurd.org

Çend wêneyek ji rêûresmên 26-ê Sermawezê-Binkeya Deftera Siyasî, û Navenda 3 ya PDKÎ












www.arsivakurd.org

Çend wêneyek ji rêûresma 26-Sermawezê li ser çiyayên Rojhilat û Başûra Kurdistanê





















Zimanê Kurdî

Qursên Kurdî, A. Karabax

4

1. Hokerên xwerû : Ev, ji yek bêjeyan pêk tên.

Mînak 521 : Ji hokerên xwerû çendek :

a. Ji nav û navdêran : Îro, duh, îşev, lez, nîvro, par, pêr, sibeh, zane.

b. Ji nav û rengdêran : Baş, bilind, kesk, mezin, rind, sax, xweş, zer.

c. Ji peyvên hokerî : Bêyî, hêdî, ku, na, par, pêr, zû.

ç. Ji yên çêkirî : Sibehê(sibeh+ê), baştir(baş+tir), zertirîn(zer+tirîn).

2. Hokerên hevedudanî : Ev herî kêm, ji du hêmanan pêk tên.

Mînak 522 : Bo pêkhatina hokerên hevedudanî, çend bikaranîn :

1. Ji yên bi bêjeyan çêdibin û bi hev ve tên nivîsandin :

Çavreş, çeperast, keskeşîn, rasterast, saxsax, serserî, xîzxîz, xurexur.

Hevok : a. Gulê xêz çeperast kişand. b. Azad, ji hespê de serserî kete erdê.

2. Ji yên bi ducarkirina bêjeyan çêdibin û cuda tên nivîsandin :

Hêdî hêdî, sar sar, teze teze, cot cot, deh deh, dilşikestî dilşikestî.

Hevok : a. Wan şîv sar sar xwarin. b. Zilam cot cot ketin hundirê malê.

3. Ji yên bi awayên tewandinê çêdibin :

Piştî nîvro, berê êvarê, sibehê zû, berî sê mehan.

Hevok : a. Dîlan piştî nîvro tê. b. Zavayê wan berî sê mehan li vir bû.

4. Ji yên bi bêjeyên dijwate û bi alîkariya gihaneka (û) ve çêdibin :

Biçûk û mezin, kêm û zêde, sar û germ, şev û roj, xwendî û nexwendî.

Hevok : a. Trên şev û roj tê û diçe. b. Xwendî û nexwendî deh kes hebûn.

5. Ji yên bi alîkariya qertafa neyîniyê(bê) çêdibin:

Bê pênûs, bê pirtûk, bê pere, bê hêvî, bê gotin, bê xebat, bê destûr.

Hevok : a. Em, îro bê pirtûk diçin dibistanê. b. Em bê destûr naxebitin.

6. Ji yên bi alîkariya daçeka (bi) çêdibin û hin peyv qertafê(î) digirin :

Bi heybet, bi lez, bi dilxweşî, bi çavreşî, bi çavsorî, bi destgiranî.

Hevok : a. Çiyayê Sîpanê bi heybet e. b. Rizgar bi lez hilkişiya.

7. Ji yên bi alikariya daçekan çêdibin : Bi, di, li, ji, de, re, ve, hwd.

Bi vir ve, bi wir de, li ku, ji ber ku, ji ku, di ku re, ber bi, ber bi ve.

Hevok : a. Kevok li ku ne? b. Kevok, ber bi Çiyayê Sîpanê firiyan.

8. Ji yên bi awayê komika bêjeyî çêdibin :

Çawa hatin wisa çûn, hatin nehatin, gotin negotin.

Tiştonek



A: Mahir Berwarî

Metelokên sirtkirna ezmanî (log-opädie)
Eve beşe nakeve di xana meteloka da, çimkî pirs û bersiv
têda nînin. Ev hevok e ji peyv û fonitîkê nêzî hev pêk tên,
gotina wan pirr giringe bo testkirna sirtî û rewaniya ezimanê zaroka.
Ev hevok e gelek cara li demê me-telokanê da dihên gotin û bikaranîn lew min bi fer zanî wan jî li vir çapbikim (33)

- Pişk û mişkên li ser derxûnkî, min pişk xar û min mişk hêla. pishk û mishk li derxwin kê, pishk dixum mishk naxum.

- Du selka, êk tû tê, êk gû tê, min ya tû tê xar û ya gû tê
havêt.
- Li dur çêl û çal ê werhatim, ketim çalê.
-Li dur îstir û hêstirê werhat im ketim îstirê.
- Miqdisî hatû ji nav rezî, ser û rihên qurmizî, 120 car Muqdisî, heyla gidî Muqdisî.
- Xalê mino, qupal simo, 7 kon konu di gupalê xalê minu.
- Heft dav dezî, heft qormizî, di kona derzîka dayka min ra bezî.

Têdîtin: Amadekar destkariya devoka metelokan nekiriye

Xwendevanên hêja! Hûn dikarin bersiva tiştonekan bi riya E-Maila Agiri2003@gmal.com ji me re bişînin

www.arsiv.wakurd.org

Agirî



Roj baş

“Serhildêrno”

www.arsivakurd.org